**Merwan Berekat**

# EVÎNA ZAMDAR

**Helbest**

Tabloya li ser qabê: **Aslan Mamo**

Amadakirina qabê û Çapê:
Sersera (Dr. med. Bashar Moustafa)
www.sersera.com
SerSera

**ISBN 978-3-96640-017-6**

***Diyarî:***

*Ji perperîkên ku berve rojê difirin û kulîlkên ku sibehan serxweş dikin re…*

*Ji çavên ku bejna riyan bi çavlirêmayînê şeh dikin û lêvên ku wate li ser çîk didin re*

*EVÎNA ZAMDAR diyar dikim.*

## Dengê dîwanê:

Derbûna derdên dil diherikin û dîmen dibin destanên dildariyê... Dilevîna dêmbixal dirjîne delxan û dibe dînbûna dildariyeke dîn, dîn û dîn....

Derbas dibin darbestên demê û dengê daholên dilmestiyê dibe dîlana dabihîstina dilên daxkirî...

Dengvedana damarên dil dibin dadana derbeyên dilêşiyê û dildar dimînin dîlê dêmkenokên dengxweş...

Di dil de daxwez û dûrbûn dibin dijber û demsalên devkumişî dibin dîdevan...

Dengbêjiya derbaskirina demên dêwî dibe derdberzî û derdkêş... Derûntenik in dildar, dildar û dildar...

Dest dixin dest û di dergûşa demê de dibin devliken... Dem û dewran in dildar...

Ahengên ahestê agirjen in

Arama afsûnkirî alafpijîn e...

Axînkêşiya Anahîta azar in

# AYET Û AMÎN Î

Ahîna...
Agirê alafdîn
Ahenga ahoreke avdarî me
Avberfîna azaran...!
Avrazên axînan alke[1]
Anahîta yî tu
Arîşenên ayendê
Awazine azwer in
Afsûna aramê...
Ayet û amîn î tu
Adarokên te
Ahengdar û azad in
Ahoya Ararat î...
Aşterûta aniha yî tu.
Agirdanka ahîn û aramê
Arîşexewneke avdarî
Ahînkêş im…
Azarkêşê te me Anahîta!

[1] - Alke: Bide aliyekî.

------------------------------------------------------- Bangên berbangê bahorên berhemêz in, balkêşiya bejna te banok e… Bejinzirav û bedew î… Birînkûr im li berêvaran binefş î… Bê bihna te bihnteng im…

## BEDEW Î

Biskên badayî
Bi bihna beybûnan
Bîrvebirin î... tu
Biriwên berkevanî
Bilbila beyaran
Barînaz î... tu
Bangîneke berdayî
Bagera birînan
Balkêşiya bê yî... tu
Bi bejina bûkanî
Bawişka buharan
Berbangnew î... tu
Binefşa li benan[1]
Baweşîna bextan
Bejinbedew î... tu
Bextxweş û bexş î
Banoka birînan
Bibêje beya kê yî... tu?

[1] - Rîf, zincîreke ji latan.

Baraaan û barîn î

Bedewiya Berbangê

Bihna beyaniyê yî… tu

Carina...
cangiran û cîgerbixwîn im
Carina...
cîgerdar û canbicanê canserê Cana me

# CANA

Cana...!
Canvejîn î
Cêwîgiyan î
    Çemşîdekî cergsoj im
Ciwaniya cobaran
Canbican...
    Cendexewna can î
Cejn e... Cana cejin e
Carekê...
Cama cewherî cihêke
Celweperest im[1]
        Cimxarê cîhana te me
Cana...!
Cihguhêr î?
Cixcixa cudawaziyê
            Cihgirekî cangor im
                        Cana...!

[1] - Celwe: Pirtûka ezdahiyan.

-------------------------------------------------------- Çêdeng û çakîpeyva çavreş î... Çeleng û çavbikil î... Çelimisî çavdêriya çavlirêmayînê çima çengbixalê çima...?

# ÇAVREŞÊ

Çavreş û çakpeyvê
Çûn çar Çarşem
Çelmisîn çalûkên çarpelî
Çima çavlirê me çima?
Çardeh çirav
Çemên çavikvejîn
Çateriyên çarqozî çareger in
Çengbixalê...!
Çaxûbeng û çavlirê me
Çima...
Çavînokî ne çeşme û çavok
Çavdan bê çiv in
Çelengê...!
Çiçikên çêjhiguvî çit in
Çardehbuharî û çepbang in
Çima...
Çirûskên çavlêdanê
Çinfirok û çir in

Çima çavreşê çima...?
Çoleder in çivîk
Çipçipa çavên çeman
Çirqîna çiloreşan
Çêwirandin çavger e
Çima...
Çerxşikestî ne Çarşem
Çima çavbelekê çima...?

------------------------------------------------------ Dinoşim derdê dil dimoşim dîlberê...! Dengvedana dildariyê di damarên dêrîniyê de jî dijene. Dibêjin dînbûn e... Dibêjin derdkêşî ye dildarî... Dilmestê dêmgula delal û dengnazik im...

## DILISTANÊ

Derdê dil delaaav e delav
Dem dibor...
Dinale...
Dilolije...
Dibêjin dildar dadwer in
Dibe jî derdfiroş in
Dîlangerê dildariyê
Dilmest...
Dengvedana dilêşiyê...
Digrîm, digrîm û digrîm
Dadkiriyê dildariyê me dilrevînê!
Dawîdî û daylan î
Dêmliken û dengşermok î
Dîn im...
Dilbidax im...
Dengê dil dîlaaan e dîlan
Dengxweş î dîlbercanê...!

Dibêjin derdberz e dildarî
Derdkêş in dildar
Dibînî...
Dibînim...
Delx diherikin
    Dildîn im dêmsêvê...
Dilbikul im...
Dilbirîn im...
De dake dilnewaziyê
Dilniyazke dilmayînê
Dermanke diljaniyê
Dilpêvebûyekî dîn im
    Dilsozê te me dilistanê...!
Dibînim dilşa yî
Dilbişewat im...
Dûrî te dilzar im
Dilzîz û dilter î
Diyariya diyazilkan dostanî ye
    Dotmîr î derwîşê te me

Digerim...

Dizêvirim...

Dinalim....

Dibim delavê dilbijandinê

Dînê te me dînê...!

------------------------------------------------------------ Em û elendê ezberkirina êvaran in û êşa  evîneke enîhilmiştî ne... Ebro ekfî ne û ez evînmest im Enîheyvê...!

## ENÎHEYVÊ...!

Enîheyvê...!
Evîndar im
Ezberdarê efsana evînê
Erêêê... erê
Evînperestekî ewledar im
Evdal im ez
Egîda evsaneyan
Eşterûta enîşkvemalandî
Erêêê... erê
Ehrîmenda evînê
Ezmîna ezmên î
Elendhezê.
Êvar e
Êşdar im...
Êşnoş im...
Êvarxweşbûnek êşbir e
Êşnasîna êşan î tu.

Fêrbext û firindeya Firdewsê yî...

Ferzende û fîrazbang im...

## FARÎN Î

Feristan im
Ferişteya Firdewsê
Farona findfiroş î tu
Ferhad im
Fenera ferperî
Fedokiya filê yî tu
Felekmest im
Feleknasa felatê
Feraşîn û ferîbend î tu
Fezende me
Firazmenda fêzbûnê
Firwaz û ferbedew î tu
Fixanwindayî
Firandim firqata firtenan
Fêrmiska firîskan î tu
Fîstangulê!
Ferikhinga firandî
Fatmûka fedokdeng î tu

Gezûbarîn in gul û gulyazên te...

Girînok in

Gupikên gilover û gomkirî...

Giyan î Gewrê...

## GEWRÊ!

Gerokekî gêjok im
Gêzbelokî ye
Gerdenê gangilîkî
Germ e...
Gazina genimê gewrik im
Gewrê...!
Galegala gêreyên gewde
Gihîştin gundên gerandî
Gerandin govendên gilgamişî
Gezok in gulyazên te
Gewrê...!
Geştiyar im...
Gavdîn im...
Gedayê gulan im...
Gehbûşkên gazîvan
Gehçok gazegaz in
Gewrê...!

Gupgup germijandî ne
Gerdenbost î...
Gêwelê geşbûna te me
Gewrê...!

Heft heyv harînên hestan in...
Haydar e hiş
û hertim
li hawîrdora hêvîrevokê...

# HÊVÎREVOKÊ

Hatim...
Herikîn hestên hêmin
Hawarnoş im...
Hêvanê hêviyan î
            Hêvîrevokê...
Hevaldostê heyvê
Hertim hejar im
Hechecokê heftper î me
Hejîna helesor î
            Hêvîrevokê...
Hemêza henûzî
Herşev hawarnoş e
Herdu hing û hemayûn
Hevcêwî û hevawaz in
            Hebûn î hêvîrevokê...
Hey, hey û hey
Heyase hezoyî ye
Hatî...

Hêro hilbişkuvîn
Hatineke hêdîka
Hêrsa hilmê yî
Hêzoka hefdehsaliya te me
Hêvîrevokê...!
Hatî...
Hilata heyvê yî
Hildibazin hev hilkumandin
Hemêzvanê herdu hinaran
Hinguvnoş im hêvîrevokê...[1]

[1] Hilkumandin: Gav û lotikên dilşadiyê.
Helesor: Guleke rengsor e.
Hemayûn: Balindeyê bextê.
Henûzî: nazikî, dilovanî
Îşe Heyase: Kembera li nava jinan.
Hezo: Navê bajarekî bakurê Kurdistanê ye.

Înan im... Înan
Îjdil  îşev...
Îşiqdan î tu

# JÎNVEJÎN Î

Jandar im
Jenîna jînê yî
Jehr e jîn bê te
        Ji jinan jêkbir î
Jibîrkirî...
Jihevkirî me
Jiberçûyî ye jiyan...
Jinaniya te
Jidayîkbûna min e
        Jixwe jînvejîn î...[1] Tu...

---

[1] Jêkbir: Cudawaz.
Jiberçûyî: Beravêtî.
Jinanî: Mêyîtî, mêzayîtî.

Kember kizwanî ye
Kulata li kêleka keskesorê
Kîwana keçîndar î
Kanî kulîlka li kaşan
Kederkêş im
Kezîzer û kejal î
Kurdê...[1]

[1] - Kulat: Perpûrên berfê.

------------------------------------------------------------ Şevên şehreyarî şopedarên şewq û şemalqendî ya Şêrîna şeng in... Şahinga şarê şanaziyê Şehrezad î... Şêrîniya şopên şemala şekirqendî şahî ne Şengê...

# ŞÊRÎNISTAN Û ŞENG Î

Şaha Şemî û şevên şên
Şahiya şevbuhêrkan..
        Şepal û Şehrezad î
Şalûla şa û şeşreng
Şox, şehnaz û şahîzê
        Şêrîn û şekirqend î
Şevsaz  û şewqdana şem
Şevşikîna şekokan
        Şevdera şayesend î
Şêrîn, şeng û şahing
Şadiyana şahgulan
        Şîlana şîlavqend î
Şivanmijûlka şînê
Şekiristana Şehreyar
        Şaha şadîpesend î
Şeş şev û Şemî şan e
Şageşa te şanî ye
      Şayest, şermok û şeyd î

Şiqşiqa şivîlokan
Şîrava şilêra şewşen
Şêlazeya şimşad î

----------------------------------------------------- Zevîsîngê te zînî ye… Zîldana zamdariyê zerber e. Zor e zewr û zarşikestin zembîlfiroşekî zamdar im Zendmermerê…!.

## ZAMDAR IM

Zîna Zêdan
Zanîbû...
Zuleyxa zamdar zêvirî
Dizanim....
Zozan û zeviyên te
Zêyî û ziwêleq in
Zacil in...
Zoyê zîveşebî
Zaxyî ye...
Zebûnê zêtûnî
Zanibe... zêrevan im
Zewr in...
Zincîrên zulfan
Zîz in...
Zendên zirav
Zarxweşê..!
Zor e... ziwabûn
Zelal zêke zemzeman
Zamdar im
Zamdar…

------------------------------------------------------------- Sih

û semaya sîngê sêvberî solînbarîn in...

Sertiya salan sîwan e...

Sêbangî me sîngbixalê....!

## SÊWÎ NE SAL

Silavsar î sêvîdêmê
Sar in sîng û sersal
Sermest û sergêj im
Sînema serbidûman î
Sê salên sar
Sêwiyê serdanan
Srtên bi sosin semaya siwaran
Sembol û strana min î
Sîngbixalê...!
Sih jî seridîn
Sawîrnoşê seyrê
Serxweşê sermemikên selt im

## LEPBÎNÎ

Lale…
Lîlavên lorandî
Lehiyên likumandî
Lavêjên lekekirî
Lax û lerzandî ne
Lepbînên lêvdeqî livok in
Lewitandin…
Lîstok…
Lihevdan…
Leylan…
Lewlew…
Lêpçandî û lêvegirtî ne
Lêxorîn ne lomekirin e
Lepbîn lopejin in…[1]

[1] - Lepbîn: Jinên ku lepên mirovan dixwînin.

## MEMIKSÊVÊ

Meraqên min
Mîna mêrgeke mê ne
Mirûzgulîn î…
Maçfedok î…
Mîna mamizmêya mêrgesorê yî
Mîna mûma matagir im
Mame megîranê te
Memîne mehtava mehewran
Merwanê te me memiksêvê!
Mest im…
Memê te me
Mîna mehên melisandî
Memikdanê mendiya te me
Mebêje menale
Melhema meraqên min î
Meygiyana Merwan î…
Maçdînê

Mêtnihrînî ye miltanê mirarkirî
Morîksorên morkirî
Mîna mêvanekî meyvexwer
Mêjokê mijmijokên te me…[1]

- Mamêzmê: Xezala mê.
- Metav: Ronahiya heyvê.
- Mehewr: Mehên pir ewir.
- Matagir: Matbûna êgir.
- Mendî: Lihevhatî. Bi erebî (rezîn).

## NEZWEŞÊ

Nêrgizên nûbişkuvî
Nameyên nîvrût in
Nihrînên nazdar naşînî ne
Newaya navê te
Naz e Narînê!
Nezweş î…
Nermba yî…
Neyloferî û nisrînî ne
Netirkên li newq û nava te
Neyşekir e navmemikên te
Nîgaşrevîn î…
Niqîndîn î…
Niyazdar û nimêjvanê
Nîsanokên nîvşevên te me
Nebêje na…
Nîvdemkî me? Na
Nêçîrvan in nihrînên te
Na na nebêje na

Nakim nalenal

Nîvxewn im….?

Na Narînê ne neşor û neşîn im

Newnewa nesaxiyê

Nediyarbûna te ye Narînê![1]

[1] Neşîn: Neşar.

Neşor: Mêrê bê ber.

Nezweş: Nişmî, letîf.

Nisrîn: Gula buharê.

Neylofer: Giyayekî li ser dêmê avê ye û kulîkên wê spî ne. Giyayekî pir nerm û rakêş e.

Netirk: Xiştir, berg, xemlên jinan.

Neyşekir: Giyayê ku şekir jê çêdibe.

Niqîn: Çavqiçkirin,

Nîsanok: Cureyek ji gangilîkên meha Nîsanê.

## PELANDINEK

Pir pêdedanên peyvan
Pêgehên peravên pîr
Parsekên poşmam
Parek ji pesindariya
Penaberiyê ne
Penaber…
Penageh…
Payîzên pirêş…
Paytextên pergalşikestî…
Pêlvedana pûçbûnê…
Pînekirî û piştxûz in
Pîvana pîşikestan
Peymanên pelçiqandî ne
Parastina payebilindan pakbûn e
Parîhez peykerên pîsiyê ne
Payegotinên pîrejinan:
Pakrewan û pelandina pelan
Pir û pir pîroz e…

# RINDÊ

Rê rengavêtî ne
Rewrewkên rêdûriyê
Raperîna rewş û rebeniyê ne
Reva li rûyê rovejînî
Ronahî ye rindê!
Rabe…
Rahêje raxisteka reyhanan
Rewendî ye razana
Razirav û rengiz î rindê!
Revandî ye rewan
Riftûbilind î…
Rondika rojê…
Rogerîna rast û rûpîroz î
Rûxistingeha min î rûheyvê! [1]

---

[1] Razirav: Nazik
Rengiz: Geşbûna kulîlkan. Kulîlkdan.
Rogerîn: Sih.
Rûpîroz: Rûyê bextê, rûbextî.
Rûxistingeh: Mihrab.

## TÊLÎ

Taveroka tîrmehê yî
Tîna te talan kirim Têliyê
Tabîderên te…
Tacîgula te…
Tavanên tentelaziya te…
Tev tavokên têrtîn in Têliyê!
Tayan im… tu tîrawir î
Talî û tûjî tolêstîn in
Tek im…
Tenê temaşevanê te me
Tajanên têrevîn tehre ne
Tenê tu tînevîn î taveheyvê!
Tenik e tavhatina te
Tî ne tamarên têrêş
Tenê tu…
Terbûn û telbîsê
Tenêtî û tengahiya min î

Tu…

Têliyê tenê tu

        Têrbûna temenê têrderd î

Teşiya temenê têrêş tevnepîrkî ye

Tevlihev im…

Tenêbûn tewşankîbarîn e

Tevizî ne tarîşev

Teysandina tavhatina te

        Tilîlandina tîbûna min e Têlî…[1]

---

[1] Tabîder: Hevdeyên por ên badayî.

Tentelazî: lihevhatin, lixwemiqatebûn,

Têrtîn: Ji tînê têr e.

Tayan: Bêguneh.

Tehre: pir sar.

Teysandin: Vebiriqandin.

Tilîlandin: Hêdikirin.

# EVÎNA ZAMDAR

Agirê dil guregur e
Avberf î li dûrî min
Ahîna şevên bê heyv
Aramî şor dihûne demê
Azarên tenahiyê ne
Bangên min….
Agirpijîna vê dûrbûnê
Adarokên hevdîtinê disotîne
Axîn û ahûnalên min
Ahengên êş û derdan in
Alaf e jiyan bê te yarê
Ariya di argûnka demê de ye
Bihna vê sibehê
Baranî û bi min xweş e
Ba ji pêlvedana meraqên buharê
Baskên hêviyan
Bajarên coşê…
Berverokî ne… roka wan î tu

Biskên te bêzar in
Berbiskên porê kejalî
Biroqî ne ey porzerê!
Balgiyê şevên di xwe de daqurtandî
Bûye pûtekî lêvtirumî
Bendewarê rêhatina te me lê dînê!
Bang li hev alîne
Berbang ji fêrmiskan şuştî ne
Babilîskên têrtoz û ziwa
Bûne pêçana roj û şevan
Bibêje kîngê
Buhar û xemlandina hevdîtnê ye?
Bibêje lê nazik û bedewê!
Cîger li ber sotandinê
Can û giyan westîn ji dûrbûnê
Çav coşdar in bo hatinê
Carekê were xanimê!
Canvejîn î lê li dûr î
Carina dibim dînekî sermest
Carina wek siha ewrekî tengijî

Cihnenas im…
Cejin û şahîvejîna min î
          Can didim li dûrî te dîlberê!
Ceng e ev jiyan
Cerdela hêviyan qol e
Carina jî tijî dilop e
Cewa temen ziwa ye
        Cêwîcana min î were
Çav li riya pêjna te ne
Çîroka dildariya min î
Çima dêşînî dil û demê
Çend sal in li benda maçeke te me
                Çavreş û lêvqenda min î
Çatî[1] û bilbilên daristanan
Çavlirê ne wek min
Çima sêwî hîştine em
Çavzerkî mane roj û şev
            Çima çelengê çima?!

[1] - Çatî: Cureyek ji kevokan e.

Çerxa felekê bê nihên e
Çêja meyê revandî ye
Çewt têne cûtin demsal
Çendî êşbar in sal
        Çima têr nakî giyan çelengî?!
Çaterê wek dînên bê tebat
Çavgerîn in bê xulmaşî
Çîvanokên bê û xunav
Çokdayî ne hertim
Çima nakewînî bîrînê
        Çîrokên sibahan nakenînî çelengê?!
Dilrevîna xwedêwend î
Di agirê vê evînê de
Dişewitim wek perîka agiran
Dinalim…
Di nav çar dîwaran de
Dilkewandî coşnoşê te me
Delşikestî me…
Dimijim ji memikên kovanan
        Derdê min giran e dêmbixalê!

Dengê gupgupên dil
Digihînin guhên pêriyan
Di navkela vê şînê de
Diherikin hêrsên kelogirî
Di bajarekî bêdeng de
Dînbûna min…
Der dibe wek lavêja lehiyan
De were lêvbideqê
            Dil hêsayî bike tenê carekê
Di holika tenahiya xwe de
Dilolijim wek dilêşan
Dirêêêj dirêj in şevên çavkul
Dibarînim hawarên ji xwe revyayî
Dirêsim…
Dihûnim…
Deng û vedenga giyanê xwe
Di bêjinga demên hişk de
            Diseridim lê giyannazê!
Eger dengê te bibihîsim
Ezê bikim nijmêja şahiyê

Eger bibînim pêjna bûkanî
Ezê biherikim wek bayê avrêlê
Eniya rengeheyvî pîroz bikim
            Erêêê bi maçên dildariyê
Ezberkirî ne; xalên li dêmên te
Evînzê yî…
Ez im noşdarê meya lêvên te
Ekrana herdu çavên reşbelek
Ez kuştim ey dîlbera kezîzer!
Em in Şêrîn û Ferhad
Ez im kesera Feqeyê Teyran
          Erê tu yî Sînema serbidûman
Eger weha bimînî li dûr
Emê bibin Mem û Zîn
Ez im kovankêşekî derdgiran
           Evîdarê te me lê memikbelê!
Êvar e…
Êvareke ji êşê avis
Êşeke ne kedîkirî
Êrîşên bîrêkirin û coşê

Êdî bûme Eyûbê piraram
Êşbir î…
Êdî bes e binalim nazdarê!
        Êvarê bikenîne tenê yek carê
Feryadên axînnoşîn
Fêrmiskên hilmxwînî
Firteneyên pêldîn in
        Felat revandine ji min
Fenerên şevan korîk in
Fedîdar e dem ji min
Ferkosî[1] ye temenê pirêş
Firdewsa hevdîtinê hêviya min
Fincikên bejna ferişteyî
Firandî ne li dûrî min
Firata[2] sibeh û rojan
        Fersed standine ji min

[1] - Ferkosî: Holbûn. Bi `erebî (terenih).
[2] - Firat: Diberdemandin.

Gerndî me ji êş û kulan
Ger bang dibin vedeng
Ger vedeng dibin bangên têrhawar
Giran e birîna dil memikçitê!
Gelawêj û elend
Girêkan vediçirînin li nêzîkî me
Gawir e bergeya bê wijdan
Ger nebim gehbûşka bejina te
Gor baştir e ji hebûna min
Gulbuhar î…
Gupika berbuhar î…
Gewr, şox û şeng î
Gavên hatinê pîroz in
Ger carekê werî lê dêmgulê!
Gerdûn ê bibe bihuşt
Gelo kîngê ye hatina pîroz?
Gewhersîng î…
Giyanê min tî ye porsolavê
Gezû ye şîlavê lêvan
Gewez in dêmên gilover

Gêj im tême gudastin[1]
        Gewrê li dûrî min î çima?
Guleroj in nihrînên min
Gulbadîn û xwînşêrîna min î
Gulhinar in lêvên te
Gulnoş in perperîkên lêvên min
Gulperiya dil î lê gulfiroşê!
          Gulgeşt in dînbûn û hestên min
Hawarnoş im erê diqîrim
Her tişt sar û mirûztal e
Hertim digerim li xwe
Hatina te xwedîtina min e
         Heyvjiyana min tilîfindê!
Hespê hêviyan likumandî ye qey?
Harîna[2] pêlan ji gazinên min e
Heyv û stêrk havêlendî[3] ne…
          Hêvînedî me lê canistanê!

---

[1] - Gudastin: Helandin.
[2] - Harîn: Dengê pêlan.
[3] - Havêlendî: Bîrveçûyî.

Hefte û roj di xwe de daqurtandî ne
Hilmtirş diborin kat û xulek
Hevringa[1] qerezên hawaran
Hûr dibire demên lêvkumişî
Hejariyê dinoşim dengbilbilê!
Helbestan dihûnim
Hey wax ji vê dûrbûnê!
Heleheleya peyvan û newayê
Hejandin sertiya nehatinê
Herdu çavên dijxew
Hertim lêpayîn in lê çavbikilê!
Heyîn î; bê te winda me
Hey wax eger tu nehat!
Hêdî nabin lixwegerîn û ez
Hêvîmana min tenê tu yî
Hin dibêjin dîn im ez
Hin tinazan dikin bi min
Hîn wek xwe me dilevînê!
Heya hebim li benda te me

[1] - Hevring: Hirîbir. Alava ku bi wê hiriya pêz dibirin.

Îjdil nexweş im
Îşev bêtir can dibase
Îlikên min êşbar in
Îşkence ye dûrbûn yarê
Îskeîska roj û şevan e
Îdek[1] ji êşgiraniyê
Încîl û Avista jî ne derman in
    Îsal Buhar çelmisî ye bê te yarê!
Jînistan î…
Jibîrkirî me çima?
Jehr e hebûn bê te dîlberê
Jenandin î…
Bibêje çima çîk nadî?
Jan e dem bê te
    Ji min dûr mere birokevanê!
Jankêş im…
Jihevketî digerim li xwe
Jar dibim roj bi roj
Ji derdê min re bijîşk î

[1] - Îdek: Tac.

Jidestçûyî ne şivlivên min
Jihevderxistina êvar û berbangan
Jixwe hatiye ji bîrkirin
            Jîndariya min î bedewê!
Kuştim vê dûrmayînê
Kanîn awirên ahoyî?
Kevokên bîranînan
Kewkirî ne baskên wan
Kuldar in dem û derfet
            Kanî li kû yî karxezalê?!
Kavilkirî diqîrin xewn
Karnefala êşan lidar e
Karwanên lavêj û nihrînan
Kederkêş in lê dîlberê!
Kîngê ezê hembêz bikim
            Kenokiya sîngkeçînê?!
Konê bêzariyê
Kirime kukumekî têrêş
Kamîranî hatiye windakirin

Kenoj[1] in rê û firkên wan
Korîkî bûne çav û hertim li rê
Karehor e[2] tenêbûn li dûrî te
Kîngê ezê ramûsim dêman?
Kerkîtê[3] êş, êş û êşan
Ko dike bergeyên hêviyan
Kewandina birînên salan
Kesek nîne ji bilî te
Keskesora sibehên buharî yî tu
Kevîriyên vî bajarî
Kevzgirtî ne bê gavên te
Ku rojekê hişyar bikî rê
Kulîlk ê bibişkuvin serûber
Keziyên daran û rîşiyên baranê
Kostekan ê bibirin bi şahî
Kirasekî bi dirî ye dûrmayîn
Kin e rê; dirêj dikî tu

[1] - Kenoj: Pexîl.
[2] - Karehor: Bayê jehrane.
[3] - Kerkît: Şeyê tevnê.

Likelika sibehên tînjibîrkirî
Lengerên di deryayên raketî de
Lîstokvanên rêbiriyê
Leqok in li pêş çavên min
Li min napirsî dilkevirê çima?!
Lêmişt û lehiyên li hev siwarkirî
Lorandina hestên nîvtevizî
Lêvtî me wek axa havînê
Li eywana vê dilêşiyê
Li pêş awêneya dînbûnê
Li xwe digerim nabînim siha te
Li min zor e nedîtina te
Lal e zimanê rêdûriyê
Lalesorên ji hilma buhat têr
Li bilbilan nakin guhdar
Lag[1] in wek çavlirêmayîna min
Lawecanê te me lewendê!
Mîna zarokekî sêwî û birçî
Maçek ji lêvên têrcoş

1 - Lag: Pirwestiyayî.

Min têr dike tenê maçek
Madtirş in…[1]
Meraqpûç in…
Malneket ji min re dibêjin
          Ma çi perwîn e dilrevîna te?!
Mêkew î; nabihîsim qebqeba te
Mêrgên rût in şevên min
Maseyên di quncikên demê de
Mey û piyal li ser dinalin
Maweya[2] di navbera me de
Mîna nihrînên pêriyeke çavkul
          Mat maye mîna şevên tolkirî
Melûl im…
Min nîne hêlûna germ
Mer û bêra êş û hawaran
          Min serûbinî hev dikin
Nalîn û hertim hawarên dil
Nehatî; salek borî ziwa
Nameyên giyanê tî

[1] - Madtirş: Mirûztirş, dêmtirş.
[2] - Mawe: Berge.

Nizanim çima netên xwendin?
Newa û vedenga bangan
        Navranên sînoran veçirandin
Nalive…
Naheje…
Nika[1] ristina êşan
Ne nependî ye rewşa min
        Neman e jiyan bê te
Odeya dîwartîk
Ofdar û ahînbar e
Ordekekî baskşikesî me
Oqyanosa seqagirtî ye jiyan
        Ozjihevketî me nazdarê!
Paldayî li ser balgiyê kulan
Pir digerînim nihrînan
Pîr bûne peyvên nameyan
Paşelagirîn ne… demên min
Pir dişewitim…
Persban nabin lêvên êgir

[1] - Nik: Hesinkê serê teşiyê.

Pêçandî me bi dînbûna xwe
Pajeya[1] evîdariyê ye dînbûn
Pilindirên şîn û bêzariyê
Paşepêş dirêsin çavên riyan
Pêsîrên hevdîtinan ziwa ne
Parzonê meraqan qul e
Pir digazim nîne çare
Paşxistina hembêzkirinê petrîşokî[2] ye
Pîrekî tambawer im
Perestgeha evîna te pîrozgeh e
Pêdeyayî me bi zixtê êşê
Pêdekirî[3] ye temen bi kovanan
Pên bi pên tême helandin
Pir zor e agirên evînê
Qerzkêşiya bergeyên li ber pîrbûnê
Qeflên nihrînan dimijin
Qaserî sergêjiyeke tolkirî
Qeflandî dilolijin demên birîn

[1] - Paje: Burhan.
[2] - Petrîşokî. Qawînokê tal û jehreyî. Bi `erebî (Henzel).
[3] - Pêdekirin: Nixmandin.

Qedandoxên dilmestiyê
Qêrînan dijmêrin bi dilgiranî
Qelendan çi ye nizanim
Rengbadayî ne tabloyên elendê
Rengên berbangan darivandî ne
Reşka çavên min mijgirtî ne
Razan di hemêza nalînan de
Roj kelogirî li xwe dizêvirin
Reşbelekiya pêjnên rêrevandî
Raçavkirî diborin
Rakêşiya wan dibe siheke qetiya
Radestî xulmaşiyê dibim
Rabêja xewnan dibe nameya rojê
Rast dêşe û çep dinale
Radiperizin[1] bi dil re hêvî
Radiqetin ji hev vedengên dûr û nêzîk
Raweşandî dimînin hawar
Razçûyî ye derdê vê evînê
Reh li benda tînê ne kezîsorê!

[1] - Radiperizin: Şer dikin.

Semaya hestan li nav terafê
Saz dipiçpiçin bi şewata dûrbûnê
Sîng bûye nêçîra gazincan
Sert in; sibehên bi ber ji xeydkêşê
Silav jî netên ji dilistanê
Sar û seqagirtî ne
Serdanên payîza xapînok
Serê min têrêş e ji xewnên beravêtî
Seqet dilikumin pên û demjimêr
Sersal nêzîk dibe bi melûlî
Sar û germ e taya dilketinê
Sawîrmêjekî dilşikestî me
Saxbûna min li ba te ye
Sazbendiya vê evînê tenê tu yî
Seyrangeha pinpinîkên lêvan
Sermemik û du gulên te ne
Seridî ne xunceyên sîngê te
Sal dibezin û dinalim li dûrî te
Sermedî ye evîndariya me
Sîngbixal î; perwîn ji siha te ne

Şehreyarekî jiyanwinda me
Şahîvejîn û Şehrezada min î
Şekirî in lêvên zirav
Şerbeta tiriyê sêvkî ye noşandina wan
Şanek li koka memikê rastê
Şahgul in dêmên rengfilî
Şadîmaniya gulyazên li ber kaniyan
Şagirtên bedewiya te ne
Şahjin û ferişteyên bihuştê
Şox î nînin mîna te bedew
Şengî î û tenê dilmestê te me ez
Şalûla li destpêka buharê yî
Şeşrengî ye fîstanê sîng bi qirme
Şiqnên ji kulîlkdanê xemlandî
Şêrîniya wan ji qeşengiya te ne
Şewqvedana neynikên ezmanan
Şanaziya wan ji awirvedana te ye
Şaşawirî ne... memikên keçîn
Şîlavhinguvî ye mêtina wan

Şayîkî[1] ne herdu zendên spî
Şemal î... şahê evîna te me ez
Taveheyva şevên konperspanî
Tînin bîra min şevbuhêrkên kêfxweşiyê
Tezezaveyî bûn hestên min
Têr nedibûn ji tazîkirina peyvên te
Tekenî[2] bûn em li paytexta şevê
Temaşe dikirin li me pêrî û ferişteyan
Tewir ji bîr nabe sîmfoniya maçan
Te dipirsî sibeh nêzîk e?
Tavilê dil digot hîn destpêk e
Tavhilata dildaran zû tê rast e
Têr nedibûn em ji hev qet
Tîna hembêzkirinê sar nedibû na
Tu îro li dûrî min î hey wax!
Têr nedibû bayê tavesorê[3]
Têr serxweş dibû ji bihna porê te
Tîbûna giyan û dilê me

1 - Şayîkî: Hilû, lûs, nerm.
2 - Tekenî: Mu`cize.
3 - Tavesor: Şefeq.

Têr dibû ji xunava lêvan
Ter vedilîst hişkbûna demên ziwa
Tîrêjên royê bi coş hembêz dikirin em
Tenê dildara min î hertim
Tu îro ne diyar î wax li min wax!
Vemrandî ye jiyan ji êşan
Veger li ahengên hembêzkirinê
Vejandina nûjiyanê ne ew
Vemirîne agirê şewata dil
Vinvina hingên lêvan
Vedizelîne sînorên bêdeng e
Vediweşwişim mîna guleleke pelweşîn
Vexwendanên sibehan nayên bihîstin
Vexumandî me wek dînekî sergêj
Vemirî ne... mûm hertim
Vêxîne carekê çira şevên tarî
Vînzê ye çavlirêmayîna min
Volkanekan e hêrsa giyan
Virdewêde dipijqin bang û nihrîn

Were carekê evînistanê!
Wekî werzeke têrxemilandî
Westî me...
Were veterisîne min ji kulan
Wek hevokeke tevlehev im
Were carekê lisaz xîne min
Wêrek be tenê şevekê
Warê min payî bike bi bayê hatinê
Wîne bi xwe re dermanê êşa evînê
Xweşik, lewend û hêvîdila min î
Xwedêwenda dildariyê
Xanima xaniman î
Xemkêş im...
Xemrevîn î lê li dûrî min î
Xav in roj û dem bê te
Xapînokî ye jiyan ku nebî tu
Xencer di dil de ku li dûr bî tu
Xewkirî dinalin perestgehên dil
Xewrevîn î... carekê were
Yarê...

Yarînê...
Zamdar im
Zamdar...

# HIŞREVÎNA KÊ YÎ?

Ji heyvekevanên biriwan
Sorsolînên lêvan
Xwedê jî serxweş dibe
Bibêje...
Dilrevîna kê yî tu?
Evînzê ne; nihrîn
Sîngzozan î
Porsolav û ahogav î
Bibêje…
Nazdara kê yî tu?
Dêmgul î
Memiksêv û dengbilbil î
Bibêje…
Hişrevîna kê yî tu?
Xewna elendê
Kengelawêj û zendzirav î
Bibêje…
Dilistana kê yî tu?

Mijangreş î
Çavbelek û nêrînmest î
Bibêje canistana kê yî tu?
Bejinperî yî
Peyvawaz û helbestvan î
Bibêje…
Hêvana giyanê kê yî tu?
Tilîmûm î
Awirşêrîn û guharzêrin î
Bibêje…
Xemrevîna kê yî tu?
Yasemînhez î
Gilîzgulav û bi xweşnav î
Bibêje…
Şahîzêya kê yî tu?
Looo dilmestooo!
Mîna rêşiyên baranê
Li tîbûna te
Digerim û digerim
Nihrînan…

Hawaran…

Bangan…

Li bejna riyan dihûnim

Li kû yî tu?

Dilrevîna te me ez.

## ŞEVEKE VELÎSTÎ

Di nav lêvên şevê de
Helbesteke windayî
Mûzîkeke jibîrkirî
Bûn xweşawaz
    Lê ne mîna dengê te bûn
Gurzek ba
Sureke finckirî
Di nav rîşiyên baranê de
Bûn ramûsanek
Lê ne mîna
    Yên lêvên te bûn
Di paşela berbangê de
Gelawêjeke keçane
Stêrkine fedok
Bûn dîlana spehiyê
    Lê ne mîna sîngê te bûn
Kulîlkên yasemînê
Qurnefîlên çolê
Bûn gulavzê
Lê ne mîna
    Ya hevdeyên porê te bû

Di nav giriyê ewran de
Ji tazîbûna çavên te
Ji feryadeke westiyayî
Dimêjînim bangên sozdar
Lê tî dimîne ev giyan

Bûme xwetirxwestineke mest
Di riya bîranînan de
Hestên velîstî
Mîna nihrînên te
Digerin li dînbûna me...

## PIRSINE XUNAVÎ

Min jê pirsî
Çima keziyên te
Mîna dengekî bêzar in?
Got: Tiliyên te koç kirine...
Looo... dildaro!!!
Ji min pirsî
Cima helbestên te ne payî ne?
Bersiv di gewriya min de girî
Ramûsanekê hêsayî kirin
Me ji şevê pirsî
Kanî dilsoziya te?
Golvedana heyvê bû awir
Û miltanê pênçbişkuvkî
Sêvên awirşaş xurandin
Sibehê ji me pirsî
Kanîn awazên evînê?
Maçan pertav kenandin
Gul bûn semaya serxweşbûnê
Em bûn helbesteke dîn…

## NABÊJIM ÇIMA

Mîna ramûsanên rojê
Mîna hilma kaniyeke zozanî
Mîna bayekî têrxunav
Di hemêza xwe de min bipêçe
Bê te bangeke tî me hertim
Keserkêş im li şev û rojan
Bangeke dîn im lêêê
Nihrîn sêwî ne lêêê
Mîna çemekî bi hêrs
Di xwe de dimiçiqim
Carekê çavan kilde ji şahiyê
Rê çavkul in çima?
Sibeh û êvar pêsîrziwa ne
Nabêjim çima

## MEYA PÊNEKÊ

Li kû yî tu?
Ji kûzê kovanan vepekîm
Kolan...
Siha min...
Û pêsîrên demê
        Li gavên lezok velikumîn
Çavên tî...
Pîroz bûn bi spî
Dînbûneke vêxistî
            Çîk da wê hîngê
D: Der bûn dengên dil
U: Du sih bûn yek
Ş: Şar bû tînvedan
E: Ezman bû evînzê
M: Meyîn meraq û miraz
Hîn serxweş im
    Ji dînbûna wê pênê

## VEWEŞWIŞANDIN

Li wir baran bû
Keçan...
Jêmayên kenê xwe
Dikirin diyarî
　　　　Tu ne li wir bû
Di kêleka min a çepê de
Straneke germ
　　　　Kelogirî dibarî
Di awazekê de
Sermest rêketim
Li xwe digerîn
Kenê keçan dibû dîlana leylanê
Li hev rast hatin em
Ji azadkirina bişkovkan
Ji çemberkirina newqan
Ji serxweşbûna maçan
　　　　Hîn vediweşwişe dem.

## LI WÊ ŞEVÊ

Li bin ezmanê nexewkirî
Li hev digerîn em
Bi me re
Gêj dibûn heyv û stêrk
            Çendî hejar bûn rê
Dil tengijî û ranewestîm
Gav westîm û dil na
Siwarê meraqeke çîkdayî
Digerîm li bangên te
Hêêê û hê...
Birînan zîl didan li şopên min
Berbangê silav da
            Bê kenê te silaveke xav
Dem dibû şano
Şanogerine windayî bûn ez û tu
Sibeh lêvşewitî...
Aso çavmiçiqî bû
Tenê maçên te

Dibin xunaveke buharî

    Payîza dil û giyan didin alî...

## BANGA DIL

Awaza straneke bi miraz î
Di ferhenga şevê de
        Vedana awireke nexweş im
Te dibînim kulîlka têrxunav î
Di nav hilma sibehê de
          Êşa birîneke bi şewat im
Dosta berbangê dêmgelawêj î
Di nav çar dîwaran de
          Kesernoşekî dilbirîn im
Helbesta bedewiyê bejinlisaz î
Li hembera awirên dînok
           Hozanekî diltî û mest im
Gula li bin baranê dêmgeş î
Li dûrî te nalenal dil û giyan
            Bê jiyan payîzeke demzer im
Wek nêrgiza li sîngê çiya geş î
Demzivistanî me li vê buharê
            Li benda te bilbilekî bêzar im

Ji perwîn û ferişteyan bedewtir î
Li benda te dişewitim dîlberê
Ji derdê te nexweş û bêhiş im.

## ÊŞLORANDINEK

Di bin landika heyvê de
Êvareke sindifkirî
Bayekî serberdayî
        Mîna me dildar in
Di hemêza şevê de
Nîvbangek...
Bêdengiyeke kelogirî
        Bi lêpayîneke me mijûlin
Êşan dilorînim
De were
Bi siha ewrekî rêbendkirî re
Bi semaya awirên stêrkan re
Di nav dîlana qurnefîlan de
Bila....
Ji meya lêvên çêjhinguvî.
          Maç mest bibin Dîlberê

## PIRSÊN ÊVARÊ

Dipelînim...
Keziyên wê xewnê
Çendî xweş e
Seyrana baranê
        Li buharên te
Bipelîne...
Hêviya di quncikên şevê de
Hawaran dibezînim
Kanî xunava têrşîlav
            Ji lêvên te?
Fedokiya heyvê
Û dîlana stêrkan
Bangên riyan dipelînin...
Elendê jî ramûsan vedan
          Hîn mame li benda te
Mîna sînorên kedîkirî
Di bêdengiyê de
Hildiperikin qeflên lavan
Melûl e; tîbûna peyalê
Ew jî dibêje:
        Kanî tîna maçên te?

## EVÎNISTANÊ

Di dengê te de
Banga sibeheke meraqzê
Di dêmên te de
Sirûda elendeke xatirxwestî
Di çavên te de
Jêmayine ji zaroktiya min
Bûne welatek
        Li sibeheke şahîvejîn digerin
Di çavên min de
Wêneyê hawarine birçî
Li ser zimanê min
Keserên helbesteke keçane
Li welatê koçberiyê
            Digerim li dînbûna xwe
Evînistanê…
Li vir an li wir
Eger şev bi me re bibin yek
Holikeke pûşî dibe bihuşt
Eger ji memikên sêwîtiyê dimijim
                Bihuşt û şev dibin dojeh..,

## ŞÎLAVA SIBEHÊ

Bihna vê sibehê
Piiir û pir xweş e
Berbang payî bûbû
Ji gulava biskên te
Mîna çemekî ji ronahiyê
Wekî çîrokeke têrevîn
Ji rengê awirên heyveke fedok
Di paşela vê sibehê de
Diherikî…
Li welatê meraqên min
Hîn sermest in lêv
Çi sibeheke fedok
Û maçfiroş e lê Cana!
Xewna nêrgizan
Difirînin pinpinîkan
Giyan jî wek dil
Ji mestiyê bûye bang
Lêêê çavhinguvê…!

## PERESTGEHA ŞEVÊ

Li ser peyala meyê
Dem bû dîla keziyên şevê
Lêvên xunavbarînî
        Reng vedan ji tîna maçan
Peyvên bêdeng in
Noşdar im noooş
Mîna xweşbihn û gulê
Di hev de winda bûn giyan
Bi me re dîîîn bûn
        Gelawêj û stêrk
Di perestgeha evînê de
Xweşiktir î ji Anahîta
Naziktir î ji Monalîza
Çavbelek î…
Awirşaş in…
        Memikên sêvî…

## TAJANEK

Ne revandina awireke nîgaşan bû
Ne henekirina henekan bû
Hîngê...
Giriyê te yê hêmin
Şahiyeke bêdeng zandin dida
Hîn daxwezkêş im
        Tenê maçekê dilrevînê!
Li ser pêlvedana bê
Dîlaneke azarkêş
Paldana xwe dihûne
Ez û rê
Di lêvgezkirina demê de ne
Stranên hawaran berdayî ne
Hêvî....
Bergerên derfetê ne
            Aramkêş im dilrevînê!
Tenê awirekê
Niha... Erê niha
Eger te got na
Ji sînorekî mirî
Yan venegereke şewitî

Yan jî....
Ji ewrekî dawvala
          Pirsa min bike
Di kêleka min a çepê de
Agirek li xwe dalê
Di mirûzê vê sibehê de
Nalenala helbestekê ye
Li xwe digerim
Hîn kila çavên te
Ji rengvedana elendê ye
         Sîngkoçerê tenê tajanekê…
Çaterê bûne zîldana hawaran
Li ser lêvên sêwî
Dișewite tîbûna maçan
Ma qey awirên te
           Zîndankirî ne?!

## DILDARÊ TE ME

\- A -
Helbesta min jî
Wek me dildar e
lê çendî xweşik be
    Têra bedewiya te nake.

\- B -
Her ku helbest hişyar dibe
Ez bi dilê xwe digrim
Ez dizanim
    Ku tu hestnazik î.

\- C -
Her ku
Bişkovkên miltanê min azad dibin
Komek pinpinîkên birîndar
        Berve xweşikbûna te difirin.

\- Ç -
Her ku dixwezim bikim hawar
Dengê min

Mîna kenê te
Dibe nameyeke dîn
Û dînbûna me
Dibe çîroka dildariyê.

- D -
Her ku dem şor dibe
Berê xwe didim royê
Navê te bilêv dikim
Dem dibe barana şêrînbûnê.

- E -
Çavê te yê rastê
Du şanikan dimêjîne
Xwezî…
Yek ez
Û ya din jî ez bama
Ez ne dîn im haaa!

- Ê -
Di hev de vedan rondik û kilê
Mijang…

Bûn zîldana helbestekê

Navnîşan `Du Ramûsanên Dîn`.

- F -

Ne ronahiya heyvê bû

Li wir

Tu li benda min bû

Gotin: Ro hilat

Hîngê şev bû

Em li wir gîhabûn hev

- G -

Pênûsa min westî

Têra xweşikbûna te nakin

Ferheng û helbest

Bedewiya bedewiyê yî tu…

- H -

Xwetir xwest

Ji dil bû ku henek e

Hîn kayîka poşmamiyê
Di gewriya demê de
Li vegerê digere

- I -

Got: Helbestên te xweş in
Helbestan, dil û hestan
Ji çavên wê re
Nimêja bedewiyê kirin…

- Î -

Her ku di çavên belek de winda dibim
Lavayên dil
Ku zû li rastî xwe netêm
Lavêjine pîroz in…

## BUHAREKE SERXWEŞ

Carina agir jî
Xewnên xwe ji bîr dike
Îro...
Peyvê çîk neda
Kêferata şahiyê bû
Xewna êgir
Di cîgerê de kizot ma
        Ez hatim û dil li wir ma
Mirin ne carek e
Pir caran bê gor mirim
Rê dihat û giyan dizêvirî
                Dîlber li wir bû
Oxir li ser pişta te
Bê xem biçe Avrêlê
Buhareke xweştir
Ez, yar û gulan bi hev re man
Gul rengfiroş in
Ez û dîlberê û du piyalan
Sorbûna piyalan ji ya meyê

Û ya meyê ji lêvên yarê
Em buhareke serxweş in

## GULDANA SIBEHEKE XUNAVÎ

Li ser zimanê me
Çiqas peyv…
Çiqas hevok…
Çiqas çîrokên şevan û nalîn
Hatin nişkekuştin
Di nav mijangên me de
Çiqas nihrîn…
Çiqas soz û wêne
Dîlkirî dinalîn
Li pêş gavên me
Çiqas rê…
Çiqas derfet û sih
Rêbendkirî dilorandin
Em li xwe digerîn
Li hev digerîn
Di guldana vê sibehê de
Xunav û bihna nêrgizan
Mîna kenê zaroktiya me
Em gihandin hev

Te got: Ji te hez dikim looo!
Min got: Dildarê te me lêêê!
Ne tenê ez
Qatek ji qurnefîlan
Yek jî ji bihna wan
Pir ma hemêza me
            Li benda te dilnazê…

## LI BIN BARANÊ

Hîngê...
Ez ne haydar bûm
Peyvek…
Gotin û meraqek
Li ser lêvên te dişewitîn

Hîngê...
Nihrînên min serxweş bûn
Di çavên te de
Dîlanek…
Nîvwêneyek…
Helbesteke kenok
Û haydarnebûna min
Hawar dihûnandin

Hîngê...
Dilopên baranê
Porê daran
Çavên avahiyan
Û miltanê gulgulî radimûsandin

Hîngê...
Tu çû û dil bi te re
Eger min bîra xwe kir

Di reşika çavên xwe de
Min li bîra min wîne…

# LI PERAVA WÎ ÇEMÎ

Li aliyê te yê rastê
Destaneya evînekê
Çavlirêmayînê dimêjîne
Sozine bazdayî ne
            Hêrsên pêlvedana te
Di dawa pîroz de
Jiyanherikandin î
Ne dûr pir li nêzîkî te
Bi gazin e dilmestek
Pirs ji te
Ma evîn tî dimîne
            Li peravên te?!
Wê Payîzê...
Ji çavên xwe agirek pijiqand
Ev zivistan...
Xemgîniyê dibarîne ji bêfilên xwe
Di bin baskê te yê rastê de
            Sîngek coşê dinoşe looo çemooo…!

## ÇEND DEMSAL

Payîzeke pêkenokî ye
Ez û xewneke nazik
Di navika demê de
Wek bîranîneke xewkirî ne
her ku hişyar dibin
        Reva me berve buhara sîngê te ye
Zerbûna şevan
Ne ji awirên Çotmehê ye
Bêzariya wî bajarî
        Di sanciya dawî de ye
Di bazingê hembêzkirinê de
Jibîrkirinek…
Êşa rojan…
Banga şevan…
Li ber zîldanê ne
De ka bibêje
Çend demsal
        Têra serxweşbûna me dikin?

# DILISTANÊ

Biskên şevê
Ji rengê kila çavên te ne
Li ser lêvên sibehê
Awazek tê pelandin
Em sazê evînê ne
Lêêê.... dilrevînê!

Di nav awirên heyvê de
Bihna wan keziyan hildimijînim
Giyantî me
Mîna nêrgiza
Di nav lêvên zinaran de
Di hawara xunavê de me
Lêêê... canistanê!

Di paşela demê de
Şev ne wek xwe tên ristin
Roj li siha payîzê dilikume
Di nav lêvên tîbûna dil de
Ev koçberî....
Li xewna xwe rast tê
Lêêê... dilistanê!

## PIRSA ŞEVÊ

Ka bibêje
Kê bi dilê xwe tu êşandî
Û payîz çi hêrsê dihûne?
Ka bibêje
Kîjan helbestê tu revandî
Û kê dilê te
Xistiye sîngê xwe?
Li ser zimanê bê
Nameyeke bê tîp
Awazine nazik dibarîne
Çima şev ne sermest e?
Dipirsim
Çima bajar mirûztirş bû
Û kolan sar bûn?
Niha şev dibêje
Agirê meraqan
Bi dawa kesran ketiye
Û di çavên sibehê de
Şahiyek nêzîk dibe.

## SURA TÎBÛNÊ

Li pişt sînorên şevê
Dengekî têrhawar
Li dînbûna me digere
Dem xewar e
Mîna sura tîbûnê
Berve hilmijîna keserekê
Diherikim bê sînor
Şev kumişî ye
Çi bikim?
Wek peyvên pîrekî
Hêviyên mirûdekî
Giriyê zarokekî
Di bêjinga bangan de diseridim
Lavêjbarîn in roj û şev
Mîna nasikekî heyştêsalî
Li perestgehên te digerim…

## BIHÊLE

Bihêle...
Di çavên te de rabim
Zarê miçiqandinê
Ji çavên sibehê rakim
Û berî nimêja cejnê
Çogvedanê ji maçekê re bikin
Yan jî...
Di perstgeha evînê de
Xwedênenas bimînim
Erê berziya dildariyê ye...

## XWETIRXWESTINEKE SOTANDÎ

Bi dengekî seyrkeyandî
Bi axîneke kelogirî
Bi rondikine şaşherikandî
Li rojeke kelrijandî
Û bi bayê hêrsekê re
Te nameya xewna me
Xiste gewriya babelîska kovanan
Û xatirxwestineke
Sotandî rêkir…
Di landika şevan de
Mîna zarokekî jibîrkirî
Perperîkeke baskşewitî
Û sozekî rêşaşkirî
Bi nêrînine bîrveçûyî
Pêjna te dipelînim
Li pêsîrên wê rojê
Wek meynoşekî hestxewkirî
Di bagera xatirxwestina te de veweşwişîm

Çi…?
Çi hîşt
Ku şahiya sêperî
Bibe vedenga
        Lorandineke nehêsayî?
Di paşela roj û şevan de
Bibim…
Mîna rengekî ji xwe revyayî
          Wek baraneke nîvbarandî?
Hîn…
Xaçkirinên wan dêman
Bi ramûsanên li sibehan
Mîna zaroktiya elendê
                    Şewqfiroş in
Hîn…
Giyan…
Hest…
Dil û hêvî soznoş in
Ne dîn…
Ne jî serxweşê

Meya tiriyê xoriz im
Mîna perperîka şevê
Bi tîna awirên te dişewitim
Çar rojên liberxweketî
Çar sibehên kulekrêketî
Mîna marekî nîvkuştî
Di riyeke kumişî de
Xwe li xwe dalînin
Ez jî…
Wek bilbilekî baskşikestî
Di nav agirê dûrbûnê de
Tenê…
Awazên hawaran difirînim
Mîna…
Kulîkeke li dawiya payîzê
Kenqurmiçî li ba dibim
Mîna…
Peyveke qetqetî
Ya li ser zimanê sêwiyekî birçî
Di êşên xwe de diherikim

Mîna…
Zengilekî bê navik
Di newalên demê de
        Bêdeng û vedeng dileqim
Li xwe digerim
Mizgîn ji te re
Dîsa di çavên te de
     Ezê xwe
          Libîr xwe wînim
Belê… Canistanê!
Jînvejandim…
Peyala ku gul li ber
Dilmest gerandim
Pîrozbahiya…
     Li Cotmeha têrkeser…

## BANGA DU DELALAN

Bi çi dengî
Tu yê hişyar bikî berbangê
Bi kîjan awirê
Tu yê kildî çavên sibehê
Li kîjan gulistanê
Gulê bibin kenê te
Di kîjan demsalê de
Emê tîşên birînan bidirûn
Lêêêê delalê…!
Ez jî mîna te
Guhdariya êskînkên zivistanî dikim
Êş û birînên min jî
Mîna dînbûna te
Li pesarê heyvê dijenin
Mîna zeviyekî tî
Li benda wê baranê me
Loooo delalo…!

## BIRÎNA DIL

Erê vemalandî ne
Birînên vî bajarî
Bihnek ji mirûzê sibehan tê
Mîna ya birîna dilê min e
Rengên kolanan
Ji heneya guliyên jibîrkirî ne
Sibeha vê taxê aramkêş e
Derdkêşiyeke rêketî ye
Dêmên gulvedayî
Berbangeke kenjibîrkirî ye
Ev bajar…
Ev tax…
Destaneke têrlorandî ye
Li vê şeva çavqirçonekî
Mest in… ez, dil û hest
Di vî hindurî de
Çar dîwar jî wek min
Noşdarên bêdengiyê ne

Nihrîn riyan dipelînin
Dipêm…
Digerim…
Dîn dizêvirim…
Westiyan derî û pencere
Kîngê dê sar bibin piyal?
Serxweşbûn e? Belêêê belê
Hevdîtin…
Serdanên kenok…
Gavên ahoyî…
Fincikên nazdar…
Çima sindifkirî ne?
Hemêza vî bajarî
Paşela vê taxê
Xewnên vê kolanê
Bûne stranên lal û bêdeng
Li gulistana hevdîtinan
Gulan avêtine reng
Bilbilan ji bîr kirine awaz
Dar mane bê sema

Danîştek tozgirtî ne
Nabêjim were dîlberê
Buhara vî bajarî yî tu
Dînokiya vê xewnê
Çîroka vê evînê
Destaneya vê dildariyê
Di kulîlkên qurnefîlan de
Şax didin lê şêrînxewê…!

## PÊŞBIRKA DILMESTIYÊ

Eger hemû çav
Dikin nimêja xewê
Tu dibî helbesteke payî
Di çavên şevê de radigerim
Dipirsim ji dil
Gelo…
Di demeke şaş de
        Fêrî evînê bûme?
Wek xeyaleke windayî
Bi tûjî tême pêçandin
Li ser lêvên piyalê
Mîna helbesteke nîvşewitî
Li benda bayê solavên te dimînim
Ku di boxazên evînê re
                    Min têr bifirînî
Sibeheke koçber im
Demsaleke ku netê dizîn im
Tenê..

Bi tîrên çavên te
Tême revandin erê
Bi zendên te
        Tême vemrandin erê
Eger tu bixwezî
Emê dilgerm bikin piyalan
Eger tu serxweş
Ez jî dîn
Û em winda bûn
Di riya stêrkan de
      Ez pêşbirka dilmestan im…

## BANGA VEWEŞWIŞANDINÊ

Belkî…
Di firkên wateyan de
Yan jî..
Di tîpeke baskşikestî de
Lê rast werim
Ta kîngê…
Pênûsê veçirîne wateyan
Û kildin çavên hevokan?
Dizanim…
Tu jî mîna min î
Di nav lêvên sibehê de
Dinoşî çavlirêmayînê
Bi hêvî û meraqan
Mişt dikî kûzên roj û şevan
Fîncana qehwê…
Guleke sor…
Lênûs…
Mûmeke girînok…

Kesereke nîvkor…
Dibin hevalên hawarên dil
Ma gelo
Demê haje êşa me heye?!
Belkî…!
Di fincên bê de
Mîna awireke revandî
Gurzek hestên firandî
Xewneke têrlorandî…
Erêêê… erê
Mîna helbesteke dîn
Di şevbuhêrka heyvê de
Li benda finceke te me
Di hemêza şevê de
Dînekî hişvelîsî me
De carekê were
Bila…
Şev di hemêza me de
Veweşwişe û veweşwişe…

## KESERKÊŞ IM

Ji rengê girî
Ji bihna bêzariyê
Ji şahîbîrkirinê
        Sibeh mirûztirş in
Destê çepê
Di xewnekê de dirêjkirî ma
Ma qe bihna gulê
Di dilopên baranê de
        Çîrokên sînoran dixwendin?!
Çûyîna vê sibehê
Hîn li pey xwe dinihêre
Ma qey gelawêjê
            Şaş dabû silav?!
Çavên vê sibehê
Keserkêş in
Awirzer in
Di neynika çavlirêmayînê de
Mîna sozekî jibîrkirî dililijim

Ne semahez im
Bi diyariya te hestmest im
Ferişte bû?
Naa... na
Siha Xwedê bû
Hîn temaşeperest im
Nihrînfiroş bû?
Awir û sazên sibehê
Erêêê… erê
Hîn ji meraqê mişt im
Biskên heyvê bûn?
Wey loo… hey lêê!
Ken û dêmên yarê bûn
Hîn dîn û serxweş im
Kulîlka sor û çavreş bû?
Hişyar be dilo
Rengên li wê bejnê bûn
Hîn keserkêş im

# BIŞKOVKA SISIYÊ

Yek
Du
Pişkuvka sisiyê
Got: Na
Ne dîn im
Ne serxweş im
Ne dilçilek im
Lê bedew î tu
Keviran jî bi dil dike
Ma gunehê min çi ye?!
Di çavên min de
Bihna sibehê…
Dilopên baranê…
Semaya nêrgizan…
Dibûn bihntengiya dil
Pişkovka çarê
Şerê ya sisiyê dikir
Sermest bûm ji nîvê sêvan

## DE HERE LÊ

Rê...
Bê nasname ne
Hêvî...
Ji rengê tozeke kor e
Sînor...
    Xewnên beravêtî ne
Bangên revyayî
Di berîkên pêlan de
Nalîn û rêzêvirandî ne
Dem dêmqurmiçî ye
Çav...
Li ber deriyên çavlirêmayînê
Ramûsanên bîranînan in
Hembêz...
Telaqên sarbûnê
Û hawareke bihnpîr e
Maseya min...
Gazina şevê ye
Bê piyal e
Ji vedenga keseran
Têêêr... têrêş e

De here lêêê...
        Oxira te bi te re be
Li pêş deriyên evînê
Di perestgeha dilsoziyê de
Lavêjan dibarînim
Belkî buhara bê
        Şahîbarîn û têrramûsan be….

## ÇÎKDANEK

Dîsa...
Di ser zimanê pênûsê de
Têne dotin
    Hest û xeyal
Vaye...
Çîkdana peyvan
Rast û çep
Dipelîne sîngê şevê
Li dor agirê dil
Dîlanê digerînin
    Perperîkên nameyên te
Dilgerm e... Zivistan
Ne tenê ji awiran
    Pir bi tîn in helbestên te
Bawişkên nîvê şevê
Reng vedane
    Ji kila çavên te
Tajanên berbangê
Hilm vegirtine
Ji bihna gulên te

Evîn ne xewn e
Di sîngê xwe de dibihîsim
Gupgupên dilê te
Mîna dînekî bê mal
Tenê ez û meraqên xwe
Digerin li paşela te…

## DESTANÊN EVÎNDARIYÊ

Nihrînên têrevîn
Awirên dildariyê evsan in
Di paşela Botanê de
Vedenga dengê herdu dilan
Çîk vedida
Kesk hildihat
Meraqên wan
Hîn keserên ferişteyan in
            Hîn banga zîldanê ne…

Di nav lêvên Sîpan de
Darmazî...
Belkî jî darguvîj bû
Destanek hûnand
Hîn…
Pinpinîkên buharan
Bilbil li berbangan
          Siyabendî difirin…

Bîrecika dîlanger
Hîn...
Ji lomeyên Ferêt bozanî dinale
Û berîkên Sirûcê
Çîrokine `Eyşanî ne…

Ne ji mêj e
Hîn çavên hedbanan
Ji fêrmiskan nehatine şuştin
Guhên Mezobotamiya
Pir stranên girînok
Kirine ayetên pîroz
Hîn....
Şengala mêrxwez
Edûlî dilorîne…

Werzoza Miksî
Ne xewna pêriyan e
Hîn...
Kaniya Spî sozdar e
Û çemê Miksê
Ji zamdariya Sînemê
Feqeyî diherike…

Ne hindik
Pir û pir
Şêrînên çerxan
Çavreşên hêvîwindayî
Kezîzerên lêvtî
        Ferhadî dinalin…

Xwedêwendinooo!
Ma hûn derewîn in?!
Sal tên dirûtin
Dem devkumişî direve
Cejin hatine jibîrkirin
Ma ne bes e
Dêmbixala min
        Merwanî dinale…

Pişta xwe da coşê û rê zirav bû
Dil dipirse:
Ma hîn newqa sibehan ji kilkila dûrbûnê
têr nebûye?!

## RISTA DÎNBÛNÊ

Di helbestên min de yî
Xwe rabanî min nakî tim
Peyv xunavmij in
Dînok in…
Mîna me dildar in
De ka em wateyan
Li ser lêvan bimeyînin
Dildarê…!
Nameya gulan
Ji bihna te ye
Nazikiya awazên bê
Ji bangên me ne
Ez im dînê bedewiya te
Nabêjim dilrevînê
Ne jî dîlberê
Ji wateya wan pîroztir î tu
Ne meyvexwer im
Ne dilfiroș û peyvmelq im
Dem tê sotin
Evînnoșê te me ez…

Pirsên havînan
Awirên payîzan
Fincên zivistanan
Ko dibin
Di buharên siha te de
Dînê te me ez
Ji kila çavên te
Ji semaya keziyên te
Ji pêlên miltanê te
Ji xewna riyên çavlirêmayînê
Li saz dixim
Ristekê ji dînbûna xwe
Ne tu ji min
Ne ez ji te
Hezkirin bi xwe ne em
Çi dibe bila bibe
Ne tenê canistan
Xwedêwenda min î tu…

# RAMÛSAN

Li ser baskên bê
Min ramûsanek ji te re şand
Li nîvê rê
Bi aliyê royê de zêvirî
Li ser gora pakrewanekî
Bi dildarî çîk da....
Ew maça te
Ya ku bi sura sibehê re
Ji min re diyarî dihat
Li nîvê rê bû mêvana
Dêmên zarokeke sêwî
Dîlberê...!
Ta ramûsanên me
Pîroz...
Rastgo û sozdar in
Lewma...
Em ji hev hez dikin…

# BÊ TE JÎNPÛÇ IM

Sibeh…
Mîna me serxweş e
Were
Bila awirên mijê
Sazekî hêdîherikandî…
Straneke nivxeydokî
          Bibin hemêza dînbûna me
Were
Bila tav
Diyariyên xunavê
Semaya lalezer û qunefîlan
Çêrandina awirên nêrgizan
Xunceyên li ber bişkuvandinê
          Bibin gulpêçana me
Ji mêj ve
Dil ducanî ye bi êşa evînê
Were…
Bila sîwana ewrekî avis

Hilma gulên têrbîn
Çîkçîkên çûkên Avdarê
Bipelînin dînbûna ramûsanên me
Ji min mepirse çima dîn im?
                Xwedêwenda min î tu
Were
Bila ferişteyên şadiyê
Kulîlkên yasemînê
Bihna sibehên fedok
Hêminiya baranê
Tîna coş û dildariyê
        Bi me re têr serxweş bibin…

# LI KÛ BÎ LI WIR IM EZ

- A -

Nihrînên wan çavan

Rengê bêzariyê ne

Dilê min agirnoş e

Ji ber ku

Rawşa min

Awêneya wê bêzariyê ye…

- B -

Li ser zimanê te

Mûzîkek raketiye

Giyanê min bêdeng e

Ji ber ku

Em bi yek giyan in…

- C -

Bêdengiya te

Bi min xweş e

Ji ber ku

Dînbûna min bideng dike…

- Ç -

Riyên koçkirinê

Bi te xweş in

Ji ber ku

Helbestên min sînor in…

- D -

Pirsî azar çi ye?

Destpêka dînbûnê ye

Carina dildarî jî

Janeke giran e…

- E -

Sal ziwa diborin

Tenê hin xulek

Dimînin banga bîranînan

Rondik jî sozdar in…

- Ê -

Bi tirs im

Ku rojekê biçûk bibim

Tenê hemêza te

Kişwera min e…

## DEMÊN DÎN

Ji sînorê gavên yarê
Hîn gulan koç nekirine
Ne jî buhara evîndariyê
Deriyên xwe girtine
Giyanê me
    Bi berbangê re hevaldost e
Di siha mijangên têrkila de
Nameyên hevdîtinekê
Û bangên dînbûnekê
Nimêja xewên dil dikin
Eger konê şevê hate vegirtin
Hîngê…
    Em dînbûnê dîn dikin
Li ser lêvên bêzar
Helbesteke xemsar
Xewnên şevine ziwa
Û rengê guleke birîndar
Hawarine bêdeng dihûnin

Eger em bigihên hev
Hîngê…
Xwedêwendên evînê
Bi maçên me dê mest bibin
Emê demê ji xwe dîntir bikin
Di sîngê keçîn de
Di pişt bişkuvkên zîvî de
Di siha miltanê gulgulî de
Memikên sêvî bel in
Eger hembêz germ bibin
Hîngê…
Emê Xwedê û ferişteyan
Bi xwe re têêêr dîn bikin
Biskên têrgulav
Keziyên bi miskê hûnandî
Dêmên ji kenekî veşartî têr
Û sîngê ji gupgupên dil velîstî
Gazindar in bi roj û şev
De were bila sêwî nemînin
Bila heyv û gelawêj dînbûnê ji me vegrin

Eger te riya mala min
Bi gavên hatinê serxweş kirin
Û Ji firefira fîstanê te
Bayên têrxunav têr dîn bû
Zanibe ku sînorên mirinê
Li paş dînbûna min man
Bi zindî kuştiyê çavên belek im
Mîna perperîka şevê
Bi agirê evîna te
Dixwezim têr bişewitim
Çendî winda bibim
Çiqas li xwe bigerim
Tenê di kişwera bedewiya te de
Têêêêr û têr xwe dibînim
Hembêza min birçî ye
Çavên min tî ne
Lêvên min çelmisî ne
Tiliyên min bi rojî ne
Dengê min daqurtandî ye
Maseya min bê piyal e

Mîna çemekî seqagirtî
Li benda tîna te me bedewê
Bê xuhdana sîngê te
Bê geşbûna dêmên te
Bê dengê mûrîkên di stiwê te de
Bê vebrûsandina guharên zêrîn
Û bê kurepistên me
Şev di xwe de pêçayî ne
Berbang rengveçengandî ye
Tîrêjên rojê sar in
Sibeh ziwa ne
Ta buhar jî bê xemil e yarê
Ji bo hatina te
Min maçên wek xwe dîn
Di berîkên…
Berbangeke kenok de
Nîvçîkdayî veşartine

## NAVEROK


- Diyarî 3
- Dengê Dîwanê 5
- AYET Û AMÎN Î 7
- BEDEW Î 9
- CANA 12
- ÇAVREŞÊ 14
- DILISTANÊ 15
- ENÎHEYVÊ...! 21
- FARÎN Î 23
- GEWRÊ 25
- HÊVÎREVOKÊ 28
- JÎNVEJÎN Î 31
- ŞÊRÎNISTAN Û ŞENG Î 34
- ZAMDAR IM 37
- SÊWÎ NE SAL 39
- LEPBÎNÎ 40
- MEMIKSÊVÊ 41
- NEZWEŞÊ 43
- PELANDINEK 45
- RINDÊ 46
- TÊLÎ 47
- EVÎNA ZAMDAR 49
- HIŞREVÎNA KÊ YÎ? 74

- ŞEVEKE VELÎSTÎ 77
- PIRSINE XUNAVÎ 79
- NABÊJIM ÇIMA? 80
- MEYA PÊNEKÊ 81
- VEWEŞWIŞANDIN 82
- LI WÊ ŞEVÊ 83
- BANGA DIL 85
- ÊŞLORANDINEK 87
- PIRSÊN ÊVARÊ 88
- EVÎNISTANÊ..! 89
- ŞÎLAVA SIBEHÊ 91
- PERESTGEHA ŞEVÊ 92
- TAJANEK 93
- DILDARÊ TE ME 95
- BUHAREKE SERXWEŞ 99
- GULDANA SIBEHEKE XUNAVÎ 101
- LI BIN BARANÊ 103
- LI PERAVA WÎ ÇEMÎ 105
- ÇEND DEMSAL 106
- DILISTANÊ...! 107
- PIRSA ŞEVÊ 108
- SURA TÎBÛNÊ 109
- BIHÊLE 110
- XWETIRXWESTINEKE SOTANDÎ 111
- BANGA DU DELALAN 115

- BIRÎNA DIL 116
- PÊŞBIRKA DILMESTIYÊ 119
- BANGA VEWEŞWIŞANDINÊ 121
- KESERKÊŞ IM 123
- BIŞKOVKA SISIYÊ 125
- DE HERE LÊ 126
- ÇÎKDANEK 128
- DESTANÊN EVÎDARIYÊ 130
- RISTA DÎNBÛNÊ 134
- RAMÛSAN 136
- BÊ TE JÎNPÛÇ IM 137
- LI KÛ BÎ LI WIR IM EZ 139
- DEMÊN DÎN 141